# WATEYA GOTINÊN ŞIVAN DI ARMANCA WAN DA VEŞARTÎ YE!

“Dînekî kevirek avîtye binê bîrê,
sed aqilbend berevbûne,
nikaribûne derxin”.
(Gotina pêşîyan)

Piştî belavkirina vîdêoya Şivan a di derbarê êzdîyan da hewar û hêwarzeyek rabû, hemû sazî û rêxistinên êzdîyan daxwîyanî belav kirin, helwesta Şivan a bê serûber rexne û şermezar kirin. Hinek kesayetîyan jî li ser vê bûyerê nirxandinên xwe pêk anîn….

Bi rastî hema di destpêkê da ez bi bawer bûm, ku Şivanê piştî wan daxwîyanî, şirove û nirxandinan dê bêhtir bi berfirehî vê helwesta xwe bike govtûgoyê û heya gazinên xwe jî bîne zimên, ku hinek êzdîyan ji wî ra çêr û dijûn gotine… Her çiqas ez bi xwe di wê bawerîyê da me, ku çi dibe, bila bibe, divê di nava gengeşî û gotûpbêjan da çêr û dijûn cîyê xwe nînbin, lê ji hêla dinê va, dema mirov gotinên Şivan dinirxîne, dibîne, ku ewî bi xwe gel anye provaktsîonê.

Ji bo ku ev rast bê têgihîştin, em binihêrin, ka bernameya Şivan çawa pêk hatye û mijara wê çi bûye. Di navendekê da komek mirov berevî ser hev kirine, û Şivan mijara kuştina jinan di nava êzdîyan da davêje hole û ewê wek taybetmendîya wê civakê dinirxîne, xwe wek dadgerekî an terbîyekarekî dide pêş, ji êzdîyan ra dibêje, ka çima ew dest ji edetên xwe yên kevn bernadin! Û li vira bêyê rayê xwe mirov dixwaze, ji vî mirovî bipirse, ma kuştina jinan tenê taybetmendîya civaka êzdîyan e? Ma di nava misulmanan, xrîstîanan û yên dinê da bûyerên vî rengî pêk naên? Ma ne, bûyerên weha bingeha xwe ya netewî nînin, bingeha wan ji pirsgirêkên civakî-sotsîalî tê.

Li vira pirsa here xeter ew e, ku Şivan van bûyeran wek taybetmendîya civaka êzdîyan dinirxîne. Ma, gelo Şivan civaka êzdîyan çiqasî nas kirye, gelo ew dizane, ku di Ermenîstana Sovêtê da 22 gundên êzdîyan hebûne, û gelo di nava van êzdîyan da tiştekî wisa hebûye. Balkêş e, dema Şivan bûyerên wî rengî di civaka êzdîyan a giştî va girê dide, hîç hatye ber heşê wî, ku dema *nav, ziman, wêje û çanda* kurdî di welatê me da qedexe bûne, di Ermenîstana Sovêtê da êzdîyan hemû nirxên netewî parastine û pêşxistine, ku piranîya rewşenbîr û nivîskarên kurd êzdî bûne (%90), ku bavê romana kurdî Erebê Şemo êzdî bûye, ku helbesta Şikoyê Hesen a “Zimanê kurdî” bûye stran û seranserê Kurdistanê û cîhanê kurd ewê wek sirûdekê distrên, ku helbesta Mîkayêlê Reşît a “Keça kurdan” jî wek stran li ser zarê her kurdekî ye, ku dengxaneya stran û sazbendîya kurdî ya Radîoya Yêrêvanê têra çend welatan dike, û ew jî ked û kedavên ewê civakê bûne!… Ji nava civaka êzdîyan bi sedan hunermend, nivîskar, wênesaz, mîmar û avakar, mamosta û bijîşkên navdar derketine û navên wan bi herfên zêrîn hatine nivîsîn… Û wek ku di nava gelê me da tê gotin, divê şiva koran li çavê mirov xistibin, ku ew wan hemûyan nabîne, û her tenê wan çend bûyerên tal wek dexmeyekê li rûyê vê civakê bixe. Ma, gelo, ev ne mijareke dûrî heş û sewdayê mirov e, helbet, eger ew mirov ne nexweş be? Ma ev çi exlaq e. ku mirov wê bûyerê bike mijara govtûgoya medya civakî? Ma mirov jî evê pirsgrêkekê li dijî civakekê wek tehdîd bikar bîne? Ma ev ne çêr û bêhurmetî ye li hember civaka êzdîyan? Îjar hela serda jî ew xwe dide xeydandin, gazinan dike!

Mirov dixwaze têbighîje, ka helwesteke weha destpêka xwe ji ku digire? Lêbelê, heş û heşmendîya mirovê normal li vira bêzar dibin, mirov nikare bersîveke heşmendî ji wê ra bibîne.

Eger mirovek pênûsê hiltîne destê xwe an jî li hember kamêrayê rûdinî, berê pêşin divê mijareke wî hebe, û ew mijar jî divê xwedî armanc û motîvatsîona gotinê be.

Û dema mirov ji vê hêlê va li gotinên Şivan dinihêre, matma dibe, heya bawer jî nake, ku mirovekî bi derûnî tendurust dikare tiştne wisa û bi wî şêweyî bide der…

Ma, çawa dibe, mirovek, ê ku ji xwe ra maf dibîne, xwe hozan û hunermend nav bike, radibe, wisa bi hêsane hinek bûyeran dike mijara govtûgo û daxwîyanîyan, û wana li hember civakê wek hêmana  êrîşên derûnî bikar tîne. Û ev helwesta di nava goveka heşmendîya mirov da bi cî nabe, helbet, eger ew mirov bi derûnî ne nexweş be.

Lewra jî, bi dîtina min, hîç pêwîst nedikir, ku li ser wan gotinên Şivan nirxandinên kûr û berfireh, an jî ewqas şirovayên siyasî-civakî pêk banyana. Bi van nirxandinan, her çiqas  di bingeha wan da rexne û şermezarkirin hene,  lê dîsa jî rê li pêşîya gengeşîyan vedikin û derfetan didin xwedîyê wan gotinan,  ku ew dîsa xwe pê bide axavtin, bikeve rewşa qaşo xweparastinê û gazinê xwe bîne zimên…

Û wisa jî bû!

Ezê li vira li ser terefê pirsê yê pîvanên exlaqî û terbîye-toreyî yên civakî ranewestim, ên ku Şivan di wê axavita xwe da pê rabûye, her dixwazim, tenê tê bigihîjim, ka armanca vî mirovî çi bûye, bi wê yekê ew dixwaze çi bibêje, û peyama wî ji bo kê ye? An ew bi vê axavtina xwe dixwaze rojevê bigihêre? Û, eger armanca wî ghartina rojevê ye (û, wek ku tê xuyan, hema wsa jî heye!), divê bê gotin, ji wî ra li hev hatye, ew gihîştye mirazê xwe! Ewî bi vê provokatsîona xwe berê hemû sazî û rêxistinên êzdîyan, kesayetî û komên civakî guhartin ser vê pirsgirêkê, bi wê va dan mijûlkirin û gelek pirsgirêkên gel di sîyê da hiştine.

Û wek ku tê xuyan, armanca wî ya sereke jî hema ev bûye!

Bala xwe bidinê, hê di destpêka sla 2014an da, dema metirsîyên êrîşên DAÎŞê li ser Şengalê hebûn, PDKê ne ku tenê ew çend pêşmergeyên xwe ji Şengalê kişandin, lê wisa jî çekên ku di destê êzdîyên wê deverê da hebûn, berev kirin, û êzdî li hember êrîşên wan hov û haran bê hêz û parastin hiştin... Û çi hate serê êzdîyan, ji xwe baş tê zanîn... Û, eger ew koma gêrîlayên HPGê nînbûya, ya ku hate hewara êzdîyên Şengalê, dê ew çend êzdî jî îro nemabûna!

Û we tirê piştî vê malwêranî tevkujîyan êrîşên li ser Şengalê rawestyan? – Helbet – na!

Rêjîma AKPê, ya ku vekirî bi DAÎŞê ra bûye yek, êrîşên li ser Şengalê hê jî didomîne, û di wan êrîşan da hêzên PDK mil bi mil bi hêzên tirkî-DAÎŞî ra di ser Şengalê da diçin... Û ya balkêş jî ew e, ku Şivan ne ku tenê vê nabîne, lê wisa jî pirsa kuştina jinan manîpûle dike, ji bo ku berê êzdîyan û civaka Kurdistanê ji sedemên trajêdîya êzdîyên Şengalê biguhêre.

Lewra jî Şivan hewl dide, ku bi daxwîyanîyên vî rengî pirsgirêkên Başûrê Kurdistanê bide jibîrkirin, ên ku ji ber hevkarîya PDKê û AKPa faşîst roj bi roj kûrtir dibin, û êdî gihîştine asta malwêranîyê.

Û ewên ku di wê salonê da rûniştibûn û guhdarîya wan qeşmertîyên Şivan dikirin, çima gelo jê nepirsîn:

– Ma, çima tu pirsa êrîşên hevpar ên AKP û PDK ên li ser êzdîyên Şengalê nanirxînî?

– Ma ew, a ku PDK-ê (bixwîne mala Barzanîyan!) xaka herêma Başûr kirye baregeha leşkerî-sîxurî ji bo artêşa dagerker a dewleta tirk, û ji wira êrîşên hevpar dibin ser Tevgera Rizgarîxwaz a Netewî, ne pirsgirêka ewlwkarîya netewî ya gelê kurd e? Çima tu li ser vê bêdeng?

– Ma ew, a ku PDK-ê (dîsa mala Barzanîyan!) di bin navê rêfêrêndûmê da nîvekî xaka Başûr (Kerkûk jî di nav da!) radestî Bexdayê kir, ne pirsgirêka netewî ye, ku mirov bîne rojevê?

–  Ma ew, a ku Barzanîyan destana Dewrêşê Evdî ji bernameyaa dibistanên herêmê derxistye, ne xiyaneta e ji ramana netewî ra? Ma ev ne mijara govtûgo û gengeşîyan e?

– Ma pirsgirêka xwekujîya jinan di herêma Başûrê Kurdistanê da nîne? Gelo Şivan hejmartye, ka ji ber rewşa siyasî, abûrî û civakî di vê herêma Kurdistanê da çiqas jinên kurd hewla xwekujîyê pêk tînin?

– Û ya dawîyê: ew. a ku îro penaberên ji Başûrê Kurdistanê li ser sînorê Bêlorûsê û Polonîyayê hasê mane, ne pirsgirêka me ye?  Çima tu li ser wê tiştekî nabêjî?

Lê Şivan van hemûyan “nabîne”, xema wî hîç pirsgirêkek jî nîne. Û ewên di wê salonê da rûniştine û guhadarîya wî dikin, ew jî bi wî ra hevnêrîn in. Ya Şivan armaanceke wî heye – her tiştî bike, ku berê civaka êzdîyan û tevayîya gelê kurd  ji pirsgirêkên heyî biguhêre. Û ev, a ku Şivan pêk tîne, parçeyekî şerê taybet ê li hember civaka êzdîyan û tevahîya Kurdistanê ye.

Belê, eger ne tenê Şivan, lê her weha ên ku li wî guhdar dikirin,  bi netewî rabûna, divê di wê salonê da pirsgirêkên ku li jorê hatin  rîzkirin, banyana rojevê û rêyên çareserîyê ji wan ra bigeryana...

Û pirsgirêka serê hemû pirsgirêkan jî îro ew e, ku dema birînên êzdîyên Şengalê hê kew negirtine, dema hêzên PDKê mil bi mil bi leşkerên dagerker ra dergehên sînoran li ser Rojava û Şengalê digirin, ji êrîşên tirkî-DAÎŞî ra dibin pêşîkar, Şivan, ji bo ku berê gel ji van êrîşan biguhêr, evê bernameyê davêje holê.

Û ya dawîyê! Eger mirovek li ser pirsgirêkên civakê tiştekî dibêje, an ew wek dilêş û xêrxwazekî dibêje, an jî wek dijmin û xêrnexwaz. Ya sêyem nîne!

De, îjar bala xwe bidine van dîmenan û baş bidin heşê xwe, gelo mirovekî hevsarê xwe dabe destê dagerker û kujerên gelê xwe, dê bikaribe nûnertîyaa pirs û pirsgirêkên gelê xwen bike?





Û dema hûn guhdarîya gotinên Şivan dikin, baş bidin heşê xwe, mirovekî bi dagerker û kujerê gelê xwe ra kete nava hevkarîyê, wek qeşmerekî ji wî ra stra, dê bikaribe, gelo bibe dengê wî gelî?

**Bê şirove!**

Sala 1910an (112 sal berê) ezdazan û zanîyarê ermenî Sîon Vardapêt Têr-Manvêlyan di derbarê êzdîyan û êzdîtîyê da pirtûkek bi sernavê «Եզիդի կուրմանճ»//“Kurmanjên yêzîdî” wşandye. Pirtûk berhemeke zanistî ye. Ew tomarîya nirxandin û danasînên di derbarê êzdîyan û êzdîtîyê da ye, û bi nirxandin û şiroveyên xwe va mirov matma dike. Tiştekî balkêş e, ku ew mirovê mezin wisa di derbarê êzdîyan da dinivîse, tuyê bibêjî, yan ew bi xwe di nava wan da mezin bûye, an jî yek ji wana bûye... Heya gelek taybetmendî, nirx û hêjayîyên êzdîyan, ên ku an bi demê ra hatuine windakirin an jibîrkirin, mirov dikare di vê pirtûkê da bibîne...

Sala 2016an derbarê vê pirtûka hêja da gotara min bi sernivîsa “Ezdazanê ermenî yê destpêka sedsala XX di derbarê êzdîyan û êzdîtîyê da” hatye weşandin.

Fermo, hûn dikarin wê gotarê bixwînin û bala xwe bidinê, dema mirov bixwaze bi

çavê mirovî li cuvakekê binihêre, dê di wê da çi bibîne...
http://www.amidakurd.net/ku/tekst/ezdazanê_ermenî_yê_destpêka_sedsala_xx_di_derbarê_êzdîyan_û_êzdîtîyê_da

Wekî dinê gotin ya we ye, xwendevanê hêja!

Li gel silav û rêzên xwe – Ezîz ê Cewo

06, 01. 2022

Pyatîgorsk/Rûsîya

Çavkanî: https://www.amidakurd.net/ku/tekst/Wateya_gotinên_Şivan_di_armanca_wan_da_veşartî_ye